

# MIZGÎN

15 Gulan 2025



# Naverok

- |                         |                      |
|-------------------------|----------------------|
| 1 Wênesazî              | 2 Wêjeya Zarokan     |
| 3 Lîsk                  | 4 Welatê me          |
| 5 Tu dizanî             | 6 Tendirustî         |
| 7 Tîp û gotin           | 8 Navdar             |
| 9 Bexçeyê Navan         | 10 Jîngeh mala me ye |
| 11 Jêhatiyên Zarokan    | 12 çîrok             |
| 16 Bixwînin û fêr bibin | 17 Çavika Mizgîn     |

Amadekirina Naverokê  
Amir Ferso

Dîzayn  
Mecid Alsadûn

Şêwekar  
Umer Ishaq  
Xalid Bîco


Sererastkirina Kurdî  
Mihemed Xanîm

Baran zagros  
Cîhan Isma'îl  
Rojhilat

Sererastkirina Erebî  
Abdulah Rehîl

**Di wêneya  
heyî de hesp û  
erebeyê reng  
bikin.**

**لوِّن الحصانَ  
والعربةَ في  
الرَّسْمِ المُرفَقِ.**



## Pisîka Newêrek


*Pisîkê miyav miyav  
Şiyar be nekeve xew  
Îşev şeva nêçîrê  
Nêçîra mişkên qelew*

*Ew Pisîka navmalî  
Mezin bû bi delalî  
Mişkan ji mal derxîne  
Bêjim tu xweş heval î*

*Pisîkê rabe rabe  
Rewşa me pir xerab e  
Mişkan arvanê me  
xwar  
Rûniştin êdî nabe*

*Pîsîkê pisîka boz  
Nerev paş xwe neke toz  
Dibêjin yê newêrek  
Tucar nabe xwedî doz*

Imran Yûsiv




# Mamîka Mîzgîn: حزورة مزكین:

Kîjan lawir li ser du lingan dimeşe û xwe cem dike? Bersiva rast ji nava wêneyên heyî hilbijêrin:

ما الحيوان الذي يقفُّ ويمشي على قدمين؟  
اختر الجواب الصحيح بين الرسوم التالية:





# GIRÊ SIPÎ

## تِلْ أَيْيُضْ

### Bajarê dîrok û bedewiyê

### مدينة التاريخ والجمال

Hevalno, we bi Girê Sipî bihîstîye? Ew bajarekî bedewe li Bakur û Rohhilatê Sûriyê ye, gelên cuda lê dijîn, weke gelê Kurd, Ereb, Ermen û Tirkmen. Ev bajare di nava xwe de gelek zeviyên kesk û çemekî dihevin. Çemê Belixê di nav wê re diherike, mîna rihên jîyanê erdê nû dike! Di demên kevin de Girê Sipî rawestgeha rêwî û bazirganan bû, îro jî bajarek e ku gelek çîrokên hevjiyanê, çand û dîrokê lê hene. Di sala 2019'an de ji aliyê dewleta Tirk ve hate dagirkirin. Ez hevala we Mizgîn soz didim we ku piştî ew rizgar bibe em ê bi hev re serdana wê bikin da ku em gul û daran di axa wê de biçînin, dîwarên wê rengîn bikin û bedewiya wê vegerînin li gorî dilê we.

يا أصدقاء هل سمعتم عن تِلْ أَيْيُضْ؟ إنها مدينة جميلة في شمال وشرق سوريا، تسكنها شعوبٌ مختلفة، من الكُرد، الذين عاشوا فيها منذ زمنٍ بعيدٍ، وكذلك العرب والأرمن، والتُرُكمان. هي مدينة مليئة بالمزارع الخضراء والأنهار، يمر نهرُ البليخ فيها كشریان حياة يُنعش الأرض! كانت تِلْ أَيْيُضْ قديمًا محطةً للمسافرين والتجار، وهي اليوم مدينة تحمل قصصًا كثيرة عن التعايش والثقافة، والتاريخ. وقد احتلتها الدولة التركية سنة 2019.

ووعدٌ مِنِّي، أنا صديقُكم المفضلة، مزيكُن سنزوژها مَعًا يا أصدقاء، بعد تحريرها لنزرع في أرضها الورود، والأشجار المثمرة الجميلة، ولنؤن جذراتها، ونعيدَها بيضاء جميلة تسرُّكم.

Tu dîzanî?

هل تعلم



Tu dîzanî?  
هل تعلم؟

## Morî û mêşa hingiv di şêwaza jiyana xwe de pir dişibin hev?


Morî û mêşên hingiv di şahsamanên mezin de dijîn, her yek ji wan xwedî roleke taybet e, ji wan parêzvan, karker û şahban hene. Di her bendegehekê de şahbanek heye, ew berpirsiyar e ku hêkan bike û komê bihêz biparêze!

Morî ji bo axaftina bi hev re bêhnê bikar tînin. Mêşa hingiv hejandina laşê xwe bikar tînin da ku ji hevalên xwe re bibêjin xwarin li ku ye! Morî tunelan çêdike û xwarinê berhev dikin. Mêşa Hingiv, hingiv çêdike û li kurmikan xwedî derdikeve. Çi cîhaneke ecêb û bi pergal e.

Hevrûkirin di navber morî û mêşa hingiv de  
مقارنة بين النمل والنحل

## النمل والنحل متشابهان كثيرا في أسلوب حياتهم؟

يعيش النمل، والنحل في ممالك كبيرة، ولكل فرد فيهما دور محدد، فمنهم الحراس، والعمال، والملكة. في كل مستعمرة توجد ملكة واحدة مسؤولة عن وضع البيوض، وبقاء الجماعة قوية! النمل يستخدم الروائح للتحدث مع بعضه. النحل يستخدم رقصة خاصة ليخبر أصدقائه عن مكان الطعام! النمل يبني الأنفاق، ويجمع الطعام. والنحل يصنع العسل، ويهتم باليرقات. يا له من عالم رائع منظم!



Hûn rojekê fikirîne ku çima bi şev xewa me têt? Xew ne tenê dema bêhnvedanê ye, lê ew sedem e ku me bihêztir, jîrtir û çalakîr dike!

Xeyal bikin ku laşê we wekî telefonekê ku pêwîstiya wê bi enerjîyê heye û dema ku tu radizê, ji nû ve enerjîyê bidest dixe! Di vê dema vehesandinê de laşê we mezin dibe, bîra we bihêz dibe û hûn serpêhatiyên herî xweş di xewna xwe de dibînin.

We qet hewl daye ku zû razên? Vê şevê biceribînin û mîna lehengekî tijî enerjî û bextewarî şiyar bibin!

هَلْ فَكَّرْتُمْ يَوْمًا، لماذا نشعرُ بالنَّعاسِ  
ليلاً؟ النومُ ليسَ وقتاً للراحةِ فقط، بل  
هو السَّبَبُ، الذي يجعلنا أقوى، وأذكى،  
وأكثرَ نشاطاً!

تخيلوا! أن أجسامكم مثل هاتِفٍ يحتاجُ  
إلى الشحنِ، وعندما تنامُ، يحصل على  
طاقته من جديد! في هذا الوقتِ  
المريحِ، ينمو جسمُك، وتقوى ذاكرتُك،  
وتجلم بأجمل المغامراتِ.

هَلْ جَرَّبْتَ يَوْمًا أن تنامَ مبكراً؟ جرِّبها  
الليلة، واستيقظ مثل بطلٍ مليءٍ  
بالطاقة والسَّعادة!

Çima em  
radizên?  
لهذا ننام؟



Hevalên hêja, tîpên kêşî hemî  
bikin; ji bo ku hûn nava li gorî  
wêneyên wan hemî bikin.





## Kobar Hawar û bi navê wêjeyî Sîmav Avrîn

كوبار هاوار، واسمها الأدبي  
سيماف آفرين

Sîmav di sala 1984'an de li Efrînê ji dayik bûye û zarokatiya xwe li gundekî biçûk ê xweşik ê Çiyayê Hawarê derbas kiriye. Wê dengê diya xwe dibihîst dema ku stranên kurdî digotin û dilê wê tijî evîn û hesret dibû.

Di sêzdeh saliya xwe de dest bi nivîsandina helbestan bi kurdî û erebî kiriye! Li ser welatê xwe, li ser leheng û evîndaran nivîsandiye. Dema ku Şoreşa Rojava dest pê kir, bi awayekî baştir û kûrtir fêrî zimanê kurdî bû û bû mamo-  
ste û zarokên weke weperwerde dikir.

Di sala 2018'an de dema ku Tirkîyê bajarê Efrînê dagir kir, Sîmav neçar ma tevî malbata xwe bajarê xwe bi terîkî ne û derbasî Ewropayê bibe. Lê wê welatê xwe ji bîrnekir û helbestên herî xweş li ser nivîsand.

Hin helbestên wê bûne stran; Hunermendan ew stran gotin û gotinên wê bûn awazek ku dil xweş dike.

Heta niha sê dîwanên wê yên çapkirî hene; Pişka Bin Giyan, Reşzeytûn û Sîmirbazî.

Heta niha Sîmav Avrîn nivîsandina helbestan ji bo we û welatê xwe dewam dike.

وُلدت سيماف سنة 1984 في مدينة عفرين، وعاشت طفولتها في قرية صغيرة جميلة على جبل هاوار. كانت تسمع صوت والدتها، وهي تغني الأغاني الكردية، فكانت تلك الألحان كالسحر، تملأ قلبها بالحب، والحنان. بدأت تكتب الشعر، وعمرها ثلاثة عشرة سنة باللغتين الكردية والعربية؛ عن وطنها، وعن الأبطال والعشاق. عندما بدأت ثورة روج آفا، تعلّمت اللغة الكردية بشكل أعمق وأجمل، وأصبحت معلمة تُعلم الأطفال مثلكم.

في عام 2018، عندما احتلت تركيا مدينة عفرين، اضطررت سيماف، أن تترك مدينتها مع عائلتها، وتسافر إلى أوروبا. لكنها لم تنس وطنها، بل كتبت عنه أجمل القصائد.

بعض قصائدها تحولت إلى أغان؛ غناها الفنانون، وأصبحت كلماتها نغماً يفرح القلب.

لها ثلاثة دواوين شعرية مطبوعة حتى الآن!

Pişka Bin Giyan - Reşzeytûn - Sîmirbazî  
ولازالت سيماف آفرين تكتب الأشعار الجميلة لكم ولوطنها.

# Hin Navên bi tîpa - **V**

**Vîndar**

**Varoj**

**Vînşer**


**Vayar**

**Vejin**

**Vîn**

**Viyan**

**Vînda**



## Ewrên baranê

We rojekê ji xwe pirsîye gelo çawa ewir li ezman çêdibe? Ewir ne tenê teşeyên sipî yên xweşikin, ew jêdera baranê ye. Dema ku ava derya û çeman ji ber germbûna rojê dibe hilma avê û diçe ezman, piştî wê ji ber cemedê tîr dibe û ewrên biçûd dide, dema ku ewrên biçûk ku bi avê dagirtîne kom dibin, baran dibare.

Tu dixwaze li malê rêbazê barîna baranê ji ewir nas bike?

Vê ezmûna xweş bi bavê xwe re li malê di dema lîstikê de pêk bîne.

Avê di firaxekê de germ bikin û dûv re qapax- eke cam ku bi kabên qeşayê dagirtî ye li ser devê firaxê deynin. Hûnê bibîne bê çawa hilma avê tîr dibe û wekî ewrên biçûk yên li ezman çêdibe.

## السَّحْبُ المَاطِرَة

هَلْ تَسَاءَلْتَ يَوْمًا، كَيْفَ تَتَكَوَّنُ السَّحْبُ فِي السَّمَاءِ؟ السَّحْبُ لَيْسَتْ أَشْكَالًا بَيْضَاءَ جَمِيلَةً فَقَطْ، بَلْ هِيَ مَصْدَرُ الْمَطَرِ الْمَتَساقِطِ عَلَى الْأَرْضِ!

عِنْدَمَا تَسَخَّنُ الشَّمْسُ الْبَحَارَ وَالْأَنْهَارَ، يَتَبَخَّرُ الْمَاءُ، وَيَصْعَدُ إِلَى السَّمَاءِ، ثُمَّ يَتَكَثَّفُ بِالْبُرُودَةِ مَكُونًا غَيُومًا صَغِيرَةً، ثُمَّ تَتَجَمَّعُ الْغُيُومُ، وَلَمَّا تُصْبِحْ ثَقِيلَةً بِالْمَاءِ، تُرْسَلُ الْمَطَرُ بِغَزَارَةٍ عَلَى الْأَرْضِ.

هَلْ تَرِيدُ مَعْرِفَةَ طَرِيقَةِ هَطُولِ الْمَطَرِ مِنَ السَّحَابِ فِي الْمَنْزِلِ؟ جَرِّبْ هَذِهِ التَّجَرِبَةَ الْمُتَمَتِّعَةَ مَعَ وَالِدِكَ فِي وَقْتِ اللَّعِبِ.

سَخِّنِ الْمَاءَ فِي وِعَاءٍ، ثُمَّ ضَعْ فَوْقَهُ غَطَاءً زَجَاجِيًّا فِيهِ مَكْعَبَاتُ ثَلْجٍ. سَتَلَاظِحُ كَيْفَ يَتَكَثَّفُ الْبُخَارُ، لِيَكُونُ "سَحَابًا صَغِيرًا" مِثْلَ الَّذِي فِي السَّمَاءِ.

Sê heval ji rengan pir  
hez dikin û her yek ji  
wan rengî xwe yê  
bijartî heye!

ثلاثة أصدقاء يُحِبُّونَ  
الألوانَ كثيرًا، وكلُّ  
واحدٍ منهم لديه لونٌ  
مفضَّل!



**Medîna Nihemed Ehmed**

bi kêfxweşî dibêje:  
Ez ji rengê sor  
hez dikim, ji ber ku  
ew rengê kulîkên  
xweşike ku bêhna  
xweş li bexçeyan  
belav dike.

**مدينة محمد أحمد**

قالت بسعادة:

أنا أحب اللون الأحمر!  
لأنه لون الأزهار الجميلة  
التي تملأ الحدائق  
برائحها العطرة.



**Şem Samî Muslit**

keniya û got:  
Ez ji zer hez dikim! Ji  
ber ku ew rengê tava  
geş e ku germî û  
ronahiyê li her derê  
belav dike.

**شام سامي مسلط**

ابتسمت وقالت:

وأنا أحب اللون الأصفر!  
لأنه لون الشمس  
الساطعة التي تنشر  
الدفء، والنور في كل  
مكان.



**Ehmed Silêman**

**Muslit**

li esman nêrî û got:  
Ez ji rengê şîn hez dikim ji  
ber ku ew rengê esmanê  
zelal e.  
Van hevalan behsa rengan  
dewam kirin û dîtî ku her  
rengê xweşikbûneke xwe  
ya taybet heye.

**أحمد سليمان مسلط**

نظر إلى السماء، وقال:  
أنا أعشق اللون الأزرق! لأنه  
لون السماء الصافية.  
وظل الأصدقاء يتحدثون  
عن ألوانهم المفضلة،  
واكتشفوا أن كل لون يحمل  
جمالًا خاصًا مثلهم!

## Çîroka :Roja Zimanê Kurdî



# ROJA ZIMANÊ KURDÎ

Silav zarokên min!  
Hûn dizanin çima  
em Roja Zimanê  
Kurdî pîroz dikin?

Ji ber ku di 15'ê Gulana  
1932'an de nivîskar  
Celadet Bedirxan  
jimara yekê ji Kovara  
Hawar bi tîpên latînî  
derxist.



Ji ber ku ew  
zimanê bapîr û  
dapîrên me ye!

Ji ber ku ew beşek  
ji nasnameya me  
ne!

Li min guhdar bikin!  
Ez ê ji we re bi zimanê  
kurdî helbestekê  
bixwînim.

Tu her hebî Şîlan!  
Helbestên me yên  
kurdî çiqas  
xweşin.



Kî peyva 'Azadî'  
binivisîne?

Ez! Ew peyva herî  
xweş e.

AZADÎ



Muzîka kurdî çêrokên  
kêfxweşî, xemgînî û  
berxwedanê vedibêje.



Em alên xwe  
bilind bikin û ji bo  
zimanê xwe  
bistirên.



Niha jî ji bo her  
zarokekî diyarîk,  
ew jî pirtûkek li  
ser çîrokên kurdî  
ye.




Em ê van çrokan  
ezber bikin û ji  
hevalên xwe re  
bibêjin.



Cejna zimanê me  
yê şîrîn pîroz be!



"Em bi zimanê xwe diaxivin, hêvî  
dikin û siberoja xwe ava dikin.  
Cejna Zimanê Kurdî Pîroz be"





Bişkoj  
بُزْعُمُ  
Bloom



Dara Xurme  
نَخْلَةٌ  
Palm



Gul  
غَوْلْدَةٌ  
Flower



Dar  
شَجَرَةٌ  
Tree

# Çavika Mizgîn

## عدسة مزكین



15 - أيار - 2025

مجاناً

# فرز كلير

العدد - 184

